Kadın Zamanı Derneği
*Komeleya Dema Jinan*
*Women's Time Association*

# RAPORA ŞOPANDİNA YA DI ÇARÇOVEYA RÊVEBERİYÊN HEREMÎ YA XWE DI GIHANDINA MEKANÎZMAYÊN SERLÊDANA TUNDIYA BI ZIMANÊ DAYÎKÊ YA JINÊN KURD ÊN KU LI STENBOLÊ DIJÎN

2023-2024

Kadın Zamanı Derneği
*Komeleya Dema Jinan*
*Women's Time Association*

Amadekar
**NEWROZ UNVERDÎ**

Şêwirmend
**HUNAV ALTÛN**

*Ev rapor; di 14ê Tîrmeha 2020an de diyariyê Fatma Atinmakas a li navçeya Melazgir a Mûşê ku ji aliye hevjînê xwe ve hatiye kuştin ve hatiye kirin.*

**2023/2024**

Ev weşan di çarçoveya "Bernameya YE Etkiniz" de, bi piştevaniya Yekitiya Ewropayê pêk hatiye. Ji naveroka vê weşanê tenê Komeleya Dema Jinê berpirsiyar e û bi ti awayî fikrên Yekîtiya Ewropayê temsîl nake.

# NAVEROK

TÊKETIN 5

1. RÊBAZ 8

2. ENCAMÊN ŞOPANDINÊ 10

3. ENCAM 22

4. PÊŞNIYAZ 26

# TÊKETIN

Li Tirkiyeyê di encamên gotinên zayendî û polîtîkayên newekhevî de ku her roj diçe cûdaxwazî û gotinên nefretî belav dibin, di serî de dibe pirsgirêka sereke ya grirîng ku her kesên tekoşîna mafparêziyê dike de tê.

Li Tirkiyeyê girîng e ku ev polîtîka û gotinên ku dibe sedema serdestiya awayê newekheviya zayendiya civakî ku dibe sedema çavkaniya cûdaxwaziyê iro divê bê diyarkirin û awayê rêyên guncav ên çareserkirinê bên pêşxistin.

Astengiya herî mezin a nepêkanîna civaka wekhev û azad ku destê wê rasterast digihîje hemû beşên civakê ya newekheviya zayendî ya civakî ya ku sedema çavkaniya cûdaxwaziyê ye.

Di Peymanên navneteweyî ya ku Tirkiye jî alîgirê wê ye bi awayê pêkanîna bi temamî ya polîtîkayên tekoşîna pêşxistinî ya tundiya li hember jînê, pêkanîna wekheviya jin û mêr û Ji holê rakirina cûdaxwazî û tundiya li hemberî jinê hatiye pênasekirin.

Bi taybetî rêgez û xalên ku xwe dispêre Peymana Ji Holê Rakirina Her Awayê Cûdaxwazîkirina Li Hemberî Jinê *(CEDAW)* di çarçoveya zagonî ya Tirkiyê de jî hatiye nişandan. Çendekek bere ku Tirkiye destnîşana xwe ji Peymana Konseya Awrûpayê *(Peymana Stenbolê)* vekişand şûnde li ser tekoşîna pêşî lê girtina tundiya nava malê û tundiya li hember jinê û bi vanan re jî bi polîtîkayên giştî ya berfireh a di qada bi tekoşîna tundîya li hember jinê pêşkêş dikir. Di zagona bi jimariya 6284 an a li ser pêşî lê girtina tundiya li hemberî jinê û parastina malbatê de girînng e ku Peymana Stenbolê di hiqûqa navxweyî ya Tirkiyeyê de cih digire ku hêjî di meriyetê de ye.

Peymanên ku Tirkiye alîgir e divê pê ve girêdayî be û divê li gor rêgezên pêkanînên mekanîzmayên pêşî lê girtina tundiyê, dezgehên raya giştî ya xebitandina mekanîzmayên û berpirsên saziyan berpirsiyariyê bigirin ser xwe.

Herî gava girîng a berpirsiyariya pêvgiredana peymanan ku bi xwe re tîne, bi rêvebirina mekanîzmayên pêşî lê girtina tundî ya sazumantiyên ku divê bê kirin bipejirîne, baş fêm bike û pêk bîne.

Biryara pêşniyaza ya Komîteya CEDAW'ê; tundiya têkildarî ya zayendiya civakî ya li hemberî jinê di Biryara Pêşniyaza Giştî ya hejmar 35 an di xala 40. a fikra **''b''** yê de [1],li hember ew kesên ku angaşta kiryarên tundiyê ne sînordarkirina dûrxistina ji malê, parastin an jî girtina biryarên qedexekirî yên awarte, şopandina wî, heke xwe li vana ranegire pêkanîna sepanên têrker li gel

*1- Ji bo dest pê kirina kirariya zagonî ya qûrbaniyên /kesên ku tûşî tundiyê mane bêyî merceke pêşîn,li gel ji holê rakirina berastengiyên ragihandinê jî di nav de ya ji bo maxdûrên berasteng, pêk anîna xwe gihandina mekanîzmayên parastî yên guncav a ji bo pêşî lê girtina tundiya bi potansiyel an jî ji bo ku careke din tundî rû nede Biryar girtina qedexeyên awarte an jî bi sînorkirina li hemberî kesên ku wekî kiryarê tundiyê tê angaştkirin ; Ev ,hewce bike ji malê bê dûrxistin û parastin, şopandina vana ,heke xwe lê negire pêk anîna sepandinan ,parastin nirxandina bi rîsk a acîl a di nav hezrên têrker a di berfirehiyê de parastinê dihewîne. Hezrên parastinê maxdûrên jin ên ku tûşî tundiyê mane .ji bar lêkirineke maliyeteke zêde,burokratîk a şehsî xwe paş de bide di dema darizandinê de yan jî piştî darizandinê ya kesên kiryar an jî bi angaşta kiryarên tundiyê ne ;mal,nepenî,dê zarok li ba kê bimîne,pêwendî û mafên ziyaretê ,xwestek,mafê jiyîna zarok û jinan,fîzîkî,cinsî li gel derûniya giştî bi biryarê ve tê girêdan.di van pêk anînan de rêgeza sûda bilnd a zarok li ber çav tê girtin*

vê yeke çarçoveya parastin û nirxandina bi risk a ku hezrên lezgîn dihewîne li Tirkiyeyê biryara dûrxistin û parastinê hatibe girtin jî gelek jin hene ku hatine kuştin. [2]

Ev xala han jinên ku neçarî tûşî tundiyê dibin ji ber ku pêkanîna kiryarî ya ku tu merca pêşîn nîn e, ev tundî dê dubare bê jiyîn. An jî di xwe gihandina pêkanîna mekanîzmayên guncav ên parastinê yên berpirs ku pêşî li tundiya bi nehênî digirin, tê zanîn ji ber ku serlêdana Fatma Altınmakas a bi zimanê dayîkê nehatiye girtinê ji neçarî vegeriyaye cihê ku tundî lê hatiye kirin û şûnde hatiye kuştin.

Di rapora tundî ya 2023yan a Platforma Rawestandina Kuştinên Jinan di 2023yan de da zanîn ku li gel biryara parastinê hebûye jî 28 jin hatine kuştin. [3]

Ev jî nîşaneya ku Tirkiye berpirsiyariya xwe ya ku alîgirên Peyman û belgeyên navneteweyî ye pêk neaniye. ev jî dide nişandan di encama polîtîkayên rewakirî û bê cezayî de tevger û gotinên zayendî pêş ketine û hêjî didomin ji ber vê yeke ne pêkanînên têrker, parastin û hezrên pêşî lê girtinê ne hatine pêkanîn kuştina jinan zêdetir kiriye.

Çareserkirina van pirsgirêkan bi pêkanîna wekheviya ji û mêr û parastina mafên jinan a ku Tirkiye alîgirê belgeyên navneteweyî ye bi bi cih anîna berpirsiyariyên xwe ya li qanûnên xwe anîn pêkan e.

Em wek Komeleya Dema Jinê dixwazin; bi amadekirina vê rapora ku di çarçoveya şopandina mafên mirovan a bi piştgiriya bernameya AB'yê ya Etkînîz'ê ye, şopandina xwe di gihandinên mekanîzmayên tekoşîna bi tundiyê ya bi zimanê dayîkê de ya jinên Kurd ên li Stenbolê dijîn piştgirî bidin vê qadê, rewşa heyî û zehmetiyên ku rû bi rû dimînin ber bi çav bikin.

Fatma Altinmakas a Di sala 2020an de li navçeya Mûşê ya Melazgirê ji ber ku ifadeya wê ya Kurdî nehatiye girtin û ji ber  nikaribûye tundiya ku lê hatiye kirin bîne ziman û nebûye gilîkar, neçarî vegerîna cihê ku tundî lê hatiye kirin maye ,piştî vegerê şûnde ji aliyê hevjînê xwe ve tê kuştin. Armanca me ew e ku Gelek jinên ku Ji ber xwe negihandine mekanîzmayên xizmetê ya bi zimanê dayîkê nikaribûne ji cihê tundiyê derbikevin û binpêkirina mafên ku rû bi rû dimînin bi awayekî derxînin holê û çareseriyek lezgîn jê re bibinin.

Di çarçoveya xebata şopandinê ya ku em bi rê ve dibin; tekoşîna tundî ya li hemberî jinê û pêkanîna wekheviya zayendiya civakî  ya jinên Kurd ên ku li Stenbolê dijîn çi qas ji mafên heyî, zagonên eleqedar û ji mekanîzmayên pêşî lê girtina tundî agahdar in. Em bale dikişînin Jinên ku bi zimanê dayîkê zehmetiyên ku xwe di gihandina va mekanîzmayên de dijîn, û di serlêdana mekanîzmayan de astengiyên ku rû bi rû mane de hatiye lêkolînkirin.

*2- https://www.birgun.net/haber/oldurulen-,fatma-altinmakas-in-sikayeti-kurtce-tercuman-olmadigi-icin-alinamamis-309477*

*3- https://kadincinayetlerinidurduracagiz.net/veriler/3088/2023-yillik-veri-raporu - :~:text=Cezasızlık devam ettikçe, koruyucu ve,kararları kadınlar için can simididir.*

Piştî vê lêkolînê  standardên navneteweyî û netewî ya li hev a bi pêk anîna mekanîzmayên tekoşînê ya bi tundiyê yên bi raçevkirinê  ku bi dest ketine hatiye nirxandin.

Di şopandina vê xebatê de belgeyên navneteweyî û sazumaniyên zagonî yên cur bi cur referans hatine girtin. Ev; Peymana Ji Holê Rakirina Her Awayê Cûdaxwaziya ya Li Hemberî Jinê *(CEDAW)*, Biryara Pêşniyaza Giştî ya hejmara 35 an a Komîteya CEDAW'ê, Pêşî lê Girtina Tundiya Nav Malê û Tundiya li hemberî Jinê,Li Gel Tekoşîna Vanan Peymana Konseya Awrûpayê *(Peymana Stenbolê)*, Zagona Pêşî lê Girtina Tundiya Li Hemberî Jinê ya Parastina Malbatê ya bi jimariya 6284an *(Zagona Jimarî ya 6284)*, Deklarasyona Pekînê û Peymana Mafên Mirovan a Awrûpayê ye.

Komîteya Ji Holê Rakirina Her Awayê Cûdaxwaziya ya Li Hemberî Jinê *(CEDAW)*, Di Biryara Pêşniyaza Giştî ya 35 an Têkildarî Tundiya Bingehîn a Zayendiya Civakî ya Jinan de sedemên di bingeha tundiya li hemberî jinê de cih digire bi awayê berfireh li gel hezir û pêşniyazên pêşî lê girtina tundiyê hatine peydakirin. Me jî pêşniyazên xwe li gor Biryara Pêşniyaza Giştî ya 35an ku wekî norma hiqûqî hatiye qebûlkirin ji aliyê navneteweyî û dewletan ve ya pêşî lê girtina tundî ya li hemberî jinê pêk anî. [4]

Ev xebata hanê; xwe gihandina bi zimanên cuda û Kurdî ya mekanîzmayên tekoşîna bi tundiyê re bê zêdekirin tê payîn ku jinên Kurd ên kû rastî cûdaxwaziya dualî tên bi pêk anîna mekanîzmayên têrker a bi tekoşîna tundiyê re ji holê bê rakirin û wan bigihîne standardên gerdûnî

Bi rê ve birina vê xebata xwe tekoşîna bi cûdaxwaziyê re ya ji ber newekheviya zayendiya civakî em pê bawerin ku dê sûdê bide xwe gihandina ya pêşxistina mekanîzmayên parastinê ya pir zimanî û pêşî lê girtina tundiya li hemberî jinê. Em hêviya xwe ya li gel avakirina dinyayek azad, wekhev, bê mêtandin û bê tundî dubare dikin.

*4- https://kadininsanhaklari.org/wp-content/uploads/2018/08/CEDAW-General-Recommendation-35-%C3%A7eviri-Nazan-Moro%C4%9Flu.pdf*

# 1. RÊBAZ

Ev rapor di navbera dîrokên 2023yan Îlon û 2023yan a Berfanbarê de bi hevdîtinên Şaredariya Beşîktaş û Şaredariya Avcilarê, li navçeyên Stenbolê yên Sultanbeylî, Beyoğlû û Bağcilari bi hevdîtinên komên navend û bi 75 jinan re ku rû bi rû hatiye kirin hatiye amadekirin.

Pêvajoya ewil ya vê xebatê ya  stratejiya şopandinê, piştî bi hevdîtina bi pêşkêşiya  piştgiriya pispor hat kirin şûnde di 2023yan a Îlonê hat pêk anîn. Li gor vê straejiyê çima pêdivî bi şopandina vê xebatê hatiye dîtin. Li gor wî salnameya xebatê, rêbaza şopandinê û armancên bingehîn hatine lidarxistin.

Pişt re lêkolîna zagonî ya têkildarî tekoşîna tundiya li hemberî jinê hatiye kirin. Piştî lêhûrbûnan raporên têkildar û xebat hatine lêkolînkirin.

Komeleya Dema Jinê bingeha vê xebatê bi serlêdana Navenda Şêwirgeha Jinê ya  ku di sala 2021î de ava dibe digire. Ji ber vê sedemê serlêdan hatine lêkolînkirin û li kîjan navçeyên Stenbolê jinên Kurd ên herî zede lê dijîn hatine diyarkirin.

Li qadê bi komên armanc û komên navend pirsên  di hevdÎtinan de kîjan bên bikaranîn hatine amadekirin. Di Cotmeha 2023yan de dubare hatina li gel ve lêhûrbûyîna li ser pirsan hatiye kirin piştî hin guherînan teşeyê dawî li wan hatiye dayîn.

Di şopandina xebatê de wekî rêbaz berhev kirina daneyan hevdîtinên rû bi rû û komên navend a bi jinan re bi hevdîtinên Şaredariya Beşîktaş û Şaredariya Avcilarê daneyên hatine bi destxistin hatine bikaranîn.

Bi xwe gihandina dildarên komeleya me ya li navçeyên diyarkirî ve ku jinên Kurd ên li van navçeyan dijîn di çarçoveya xebatê de pirsên ku hatine amadekirin de pirs hatine pirsin.

Li her navçeyê 25 jin bi giştî 75 jinan re rû bi rû hevdîtin hatiye pêkanîn şûnde bi 2 komên navend ên rû bi rû hevdîtin hatiye pêkanîn. Di hevdîtinên her komên navendî de 6 jin tevlî bûne. Di van hevdîtinan de jinên ku cih girtine bi berfirehî nîqaş bi wan re hatiye kirin.

Di xebatên şopandinê de zehmetiya herî girîng ku em rû bi rû man, xwe gihandina jinan û di dema hevdîtinan de fediya di warê xwe îfade kirinê de bû, di plansazî kirina hevdîtinên Şaredariyan de ji bo randevu girtinê ji 4 Şaredariyan ku me xwe gihande wan 2 ji wan Şaredariya Kadikoy û Şaredariya Şîşliyê ji ber erênî yan neyînê lêvegera wan çênebû ev jî di salnameya xebatê de bû sedema zehmetiya ya din.

Bi 75 jinên ku rû bi rû hevdîtin bi wan re hatiye kirin di gel bersivên pirsên ku hatiye bikaranîn dahûrandina daneyan hatiye kirin. Pişt re bi du komên navend ku ji 6 kesan pêk tê re hevdîtinên bi hûrgulî û di hevdîtên şaredariyan de me cih da serpêhatî û daneyên ku derket holê, di amadekirina raporê de daneyên ku bi dest ketine û zehmetiyên ku derketine û binpêkirina mafan li gor pêk anîna peymanên navneteweyî û zagonên netewî ya Tirkiyeyê di raporê de hat bikaranîn.


Di çarçove û amaca zagonên parastina daneyên şexsî Li gor hejmara zagona 6698an ku li ber çav hatiye girtin di raporê de nav û agahiyên taybet a tu jinan nehatiye bikaranîn.

# 2. ENCAMÊN ŞOPANDİNÊ

Komeleya Dema Jinê  di navbera dîrokên 2023yan a Berfanbarê û 2023yan a Cotmehê de di çarçoveya xebatê ya şopandinê de li navçeyên Sultanbeylî, Beyoglû û ya Bagcilarî  bi şaredariyan û jjinên ku hevdîtin bi wan re kirine de daneyên ku hatine bi dest xistin dahûrandina wan hatiye kirin.


Li gor wî; navbera temenê ya serlêdanan, rewşa zewacê, awayê pênasekirina tundiyê, tûşî tundiyê bûye yan nebûye heke bûbe serî li saziyek daye yan nedaye, tundiyê ji kê dîtiye, ji mekanîzmayên ku piştgiriya zimanê Kurdî didin agahdar e yan na, di pêvajoya serlêdanê de dema bi Kurdî axiviye wê rehetiyê dan an na, dema bi Kurdî hatiye axaftin zehmetiya herî sereke çi bûye û mekenîzmayên tekoşîna ya bi tundiyê re ya di derheqê çareseriya pêşniyazên di derbarê zimanê dayîkê de zehmetiyên ku derketine pêş daneyên wan di tabloyan de hatine pêşkêşkirin.

Piraniya jinên ku me hevdîtin bi wan re kiriye di navbera komên temenê wan ji 25 û 35an ku pêk hatiye. Yên duyem ji komên temên wan 35 û 44an û 45 û 54an pêk hatine.




Ji nîvî pirtir jinên ku me hevdîtin biwan re kiriye bi destheqê xwe li tu karekî nexebitîne wekî kedkarên malê tên dîtin di hevdîtinên ku bi jinan re hatiye kirin bi awayekî daxilî jiyana wekhev a aboriyê nehatine kirin, ev jî newekheviya di bi cih kirina kar dide nişan. Peymana Ji Holê Rakirina Her Awayê Cûdaxwaziya Li Hemberî Jinê *(CEDAW)* Di xala 11.a fıkraya **"a"** û **"b"**yê de jinervegera mafê xebatê ya ji bo hemû mirovan karîneriya di pîvanên wekhev a meran de ji bo jinan nehatiye karînerkirin û jin daxilî jiyana aboriyê ya wekhev nehatiye kirin. Ev jî dide nişan ku mafê xebata tevlîbûna jiyana aborî ya jinan binpê dike. [5]

## HÜN BI DESTHEQE XWE LI KAREKI DIXEBITIN




## JI VAN REWŞÊN KU MIN JI WE RE XWENDE HÛN TÛŞÎ ÇENDÊN Jİ WAN MAN?





*5- Peymana Ji Holê Rakirina Her Awayê Cûdaxwaziya Li Hemberî Jinê (CEDAW) Di xala 11.a fıkraya" a" û "b"yê de jinevegera mafê xebatê ya ji bo hemû mirovan, mafên xwedî derfetên a bi meran re ya di qada xebatê de.*

Hat dîtin ku ji  %42 jinên ku me hevdîtin bi wan re kiriye rastî tundiya derûnî, ji sedî %30,40î rastî tundiya fîzîkî piştî wî şopandina domdar û rastî tundkariya aboriyê bûye. Di xala 1. A Biryara Pêşniyaza Giştî ya hejmara 19 an ku pênaseya cûdaxwaziyê hatiye kirin.

Li gor vê pênaseyê; jinên ku tûşî awayên cur bi cur a tundiyê tên rastî binpêkirinên, mafê jiyanê, skence û tevgerên zalimane miameleya biçûk xistin a dermirovane tûş nehatina mafê bê cezayî, mafên ewlekarî û azadiya kes î tên. [6]

*(GER PIRSA 15.ERÊ BE)* **WE EV TUNDÎ JI KÊ DÎT?**





Ji sedî %58,2'yên jinan diyar kirin ku, tundiyê ji hevjînê xwe û mêrên ji nava malbatê dîtine

Dîsa daye nişandan ku jinên ku bersiv dane me; **'cihê herî ewle'** ku tê zanîn saziya malbat û malê ji bo jinan bi risk û ne ewle ye, di demen dawî de tundiya ku di nava malbat xaniyan de zede bûye ne pêkan e ku em ji destkeftiyên jinan cihê bigirin dest. Her ku destkeftiyên jinan bên hedef girtin û asayî kirina tundiya li hemberî jinê hem di nav malbatê hem jî ji aliyê polêsan ve diha bi lez berbelav dibe.

*6- Di xala 1. a biryara pêşniyaza giştî ya hejmara 19 an pênaseya cûdaxwaziyê hatiye kirin. Cûdaxwazî li gorî zayendê tundiya bingehîn dihewîne. Ev gef fîzîkÎ,hişî û zirardayîna cinsî û tevgerên êş kişandinê di xwe de dihewîne. bi kar anîna mafên mirovan a dibin peymana mafên mirovan de ku ji jinan re dibe asteng an jî awayê cûdaxwaziya ku xwe dispêre tundiya zayendiyê xeterê bi xwe pêk tîne. Ev azadî maf; (a) mafê jiyanê; (b) mafê skence Û tevgerên zalimane miameleya biçûk xistin a dermirovane tûş nehatina mafê bê cezayî ; (c) mafê parastina wekhev a li gor normên mirovî ya di rewşêm şerên çekdarî nav welêt û navneteweyî;(d) mafê ewlehî û azadiya kes ; (e) mafê sûdwergirtina awayê wekhev a ji hiqûqa parastî ;(f) mafê wekhevya di nava malbatê de; (g) mafê tendirustiya giyanî /rihî û fîzîkî ya di asta standaRdên herî ya jor ku bi destxistna wê pêkan e.*

## *(GER PIRSA 15. ERÊ BE )* PIŞTÎ KU WE TUNDIYÊ DÎT WE SERÎ LI SAZIYEKÎ DA ?





Ji sedi %83,9 an jinan bersiva na yê daye vê pirse. Li gel vê pirse heke bersiva we na bû ji jinan re pirsa we çima serî lê neda hatiye pirsin; ji ber kiryarê tundiyê ji malbatê yek bûye, li Tirkiyeyê li gel biryara dûrxistin û parastinê kuştinên jinan zede bûye 7 da zanîn ku ji ber sedema pêşî lê ne girtina kuştinên jinan ji bê baweriya ji saziyan serî li tu saziyekî nedane.

Di xala 24. a fıkraya **'b'** yê ya Biryara Pêşniyaza Giştî ya bi hejmara 19an 8  ku hatiya diyarkirin; zagonên bingehîn a li dijî tundiya zayendî ya ji bo parastina hemû jinan peşkeş dike.

Bi awayek perwerdehiya bi hestiyariya zayendiya civakî ya peywirdarên raya giştî û xebatkarên pêkanîn û yê dadmendî ku nehatiye pêkanîn, bi cih neanîna berpirsiyariya saziyan, bê baweriya jinan a ji saziyan û xwe negihandina van mekanîzmayan bûye sedem.

*7- https://kadincinayetlerinidurduracagiz.net/veriler/3088/2023-yillik-veri-raporu - :~:text=Cezasızlık devam ettikçe, koruyucu ve,kararları kadınlar için can simididir.*
*8- Fikra 'b' ya xala 24. a Biryara Pêşniyaza Giştî ya 19an ku dewlet alîgirê wê ne, ji bo pêk anîna çalak kirina Peymanê neçar in tundiya nav malê û îstîsmar,tecavuz,êrîşa cinsî û zagonên li hember tundiyê ya zayendiyên din ji bo hemû jinan parastineke têr pêşkêş bike û rêz dayîna rûmeta ya jin parêziyê divê bê pêkanîn.Ji bo maxdûran pêk anîna xizmetên piştgirî û ya parastina guncav divê bê kirin.peywirdarên raya giştî pê re ya xebatkarên pêkanîner û yê edlî divê bi awayekî perwerdehiya bi hestiyariya zayendiya civakî bên perwerdekirin.*

## HÛN AN JÎ KESEKE NÊZÎ WE KU TUNDIYÊ BIBÎNE ZANÎNA WE YA DI DERBARÊ HÛN Ê SERÎ LI KÎJAN SAZIYÊ BIDIN HEYE GELO ? HEKE BERSİV ERÊ BE WE VÊ AGAHIYÊ JI KÎJAN SAZIYÊ GIRT?





Daye nişan ku ji nîvî pirtirê jinan bi dayîna bersiva erê dema ku tûşî tundiyê hatibe haya wan dê serî li kîjan saziya bidin hebû ye.

Dan zanîn ku jinên ku tûşî tûndiyê hatine agahiyên di derbarê dê serî li kîjan sazîyan bide wiha ne; Ji sedî %26,2 yê wan ji komeleyên jinan û medya civakî, ji sedî %16 ji polêsan ji sedî %12 ji partiyên siyasî hînbûne. Ji sedî %45.8'ê ji wan vê pirsê nebersivandine.

Jı sedî %91'ê jinan da zanîn ku  zêdetir bibin xwediyê agahiya ya di mijara tekoşîna tundiyê de.

## HÛN DIXWAZIN BIBIN XWEDIYÊ AGAHIYÊ YA BERFIREHTIR A DI VÊ MIJARÊ DE?





Piraniya jinan xwestine ku bi Kurdî bên agahdarkirin.

## GELO DI VÊ MIJARÊ DE HÛN DIXWAZIN BI KURDÎ YAN BI TIRKÎ BÊN AGAHDARKIRIN ?




Ji sedî %94,7'ê jinan ji hebûna mekanîzmayên ku bi zimanê Kurdî piştgiriyê didin bê agahdar in, di hevdîtên ku me pêk anîye de dan zanî n ku di saziyên fermî dema bi Kurdî diaxivin kesê/a ku dê ji wan re bibe alîkar bibînin jî rastî pirsgirêka piştguh kirina ya rû bi rû hatine. Ev nişaneya kêmdayîna ku bi taybetî di serlêdanên ewil ên fermî yên wekî buroyên ewlehî û qerekolan de cih nedane xizmeta bi zimanê Kurdî ev jî kêmaniya rêveberiyên heremî ya şaredariyan ku xebatên bi pir zimanî esas hatiye girtin lê ji ber ku di vê qadê de xebatên xwe berfireh nekirine dide der.

Biryara Pêşniyaza Giştî ya bi hejmara 35an a di xala 43yan de ya li Tirkiye ya ku tûşi cûdakariyê maye, jinên ku li vî welatî dimînin lê bi zimanê fermî nizanin bi pêkanîna xwe gihandina çavkaniyên agahiyên zagonî û civakî û li gel bi belav kirina van agahiya berpirsiyar e jî, dide nişan ku jinên Kurd ên li Stenbolê dijîn di mekanîzmayên piştgiriyê de piştgiriya bi zimanê Kurdî, di mekanîzmayên tekoşîna bi tundiyê re ya bi zimanê dayîkê re piştgiriya agahdarkirinê ya çi çavkaniyên ku ew xwe dikarin bigihînin ê nehatiye dayîn.





*9 - Xala 43yem a biryara peşniyaza giştî ; bi taybetî yên ku xwendin û nivîsandinê nizanin û berastengên ku tûşî cudaxwaziya ya piralî mane yan jî (welatê ku lê dimînin) di serî de ji bo jinên ku zimanê wan ê fermî nizanin an jî bi asteke hindik dizanin ji bo jinan bi rêyên qenalên medyayê ya xwe gihandina cur bi cur û diyaloqa navxweyî ya civakî ya mexdûrên tundiya beralî ya zayendiya civakî ya berpêbûna jinan / ji bo heyîna kesên ku rastî vê tundiyê mane ya li gel derbarê tazmînatê jî têde, agahiyên di derbarê ya xwe di gihandina çavkaniyên civakî û zagonî ya pêkanîna wan û belavkirina van agahiyan.*

## DI PÊVAJOYA SERLÊDANÊ DE HÛN Ê REHET HÎS BIKIN KU HEBÛNA XIZMETÊN PIŞTGIRÎYÊ Û AGAHDARKIRINA YA BI KURDÎ HEBE ?




Hema tevahiya jinan da zanîn ku di pêvajoya serlêdanê de bi hebûna xizmetên piştgiriyê û agahdar kirina bi Kurdî dê rehettir hîs bikin.


## DEMA HÛN BI KURDÎ DIAXIVIN ZEHMETIYA SEREKE YA KU HÛN RÛ BI RÛ DIMÎNIN ÇI YE ?




Nîvê jinên ku me bi wan re hevdîtin kiriye da zanîn ku di serlêdanên saziyan de dema bi Kurdî axivîne tûşî cûdaxwaziyê hatine. Zagonên netewî ya Tirkiyê û peymanên navneteweyî ya ku Tirkiye jî alîgir e, di berpirsiyariya çarçoveya ku bûye sedema newekheviya zayendiya civakî û tundiya li hemberî jinê ya ji bo ji holê rakirina cûdaxwaziyê divê polîtîkayan biafirîne û bi awayekî van polîtîkayan pêk bîne. Di xala 14. A Peymana Mafên Mirovan a Awrûpayê de ji ber cudahiya zimanî cûdaxwaziyê qedexe kiriye. Ji bo axavtina bi zimanê Kurdî ya jinan a di serlêdana saziyan de ku tûşî cûdaxwaziyê hatine nîşaneya binpê kirina xala 14.a PMMA'yê ye.

Bi jinên ku me bi wan re hevdîtin pêk aniye pirsa **''dema hûn tûşî tundiyê tên çi pêşniyazên çareseriyê ya bi axavtina zimanê Kurdî de ya di serlêdana saziyan de zehmetiyên ku hûn rû bi rû dimînin dixwazin bikin ?''** ku me kir; pêşniyaza ya jinan a ewil pêkanîna çareseriya makezagonî, ya duyem bi cih kirina kar a xebatkarên ku piştgiriya bi zimanê Kurdî didin û jinên ku tûşî tundiyê tên di serlêdana mekanîzmayên de xizmetên bi zimanê dayîkê ku tê kirin bên zêdekirin

## DEMA HÛN TÛŞÎ TUNDIYÊ TÊN HÛN ÇI PÊŞNIYAZÊN ÇARESERIYÊ YA BI AXAFTINA KURDÎ YA DI SERLÊDANA SAZIYAN DE LI GEL ZEHMETIYÊN KU RÛ BI RÛ DIMÎNIN DIXWAZIN BIKIN? *(JI YEKÎ ZÊDETIR HÛN DIKARIN BIBIJÊRIN)*



# ŞOPANDINA ŞAREDARIYA

Bi Rêvebirina ya bi piştgiriya Yekîneyên Awrûpayê ya ETKÎNÎZ'ê ya pêşî lê girtina tundiya li hemberî jinê ya li cihê ku berpirsiyariya girîng dikeve ser mile Saziyên Sivîl ên Civakî û rêvebreriyên heremî ku tê dîtin. **"di şopandina çarçoveya rêveberiyên heremî ya jinên Kurd ên li navçeyên Stenbolê ya Sûltanbeylî,Beyoglû û Bagcilarê de dijîn xwe gihandina mekanîzmayên serlêdana tundî ya bi zimanê dayîkê."** piştî xebatên li qadan a di rêvebirina çarçoveya xebata ya 3 navçeyên SûltanbeylÎ, Beyoglû û Bagcilarê şûnde, me bi Navenda Şêwirgeha ya jinan a Şaredariya Avcilar û Navenda Şêwirgeha ya Jinan a Şaredariya Beşîktaşê re hevdîtinan pêkanî.

Yek ji xebatên şopandina me ya berhevkirina daneyan a gava ewil bi pêk anîna Hevdîtinên bi Navenda Şêwirgeha ya jinan a Şaredariya Avcilar û Navenda Şêwirgeha ya Jinan a Şaredariya Beşîktaşê re bû. Di hevdîtinên pêkanîna van saziyên de, agahiya dayîna di derbarê xebata ya çarçoveya şopandina rêveberiyên heremî ya xwe gihandina mekanîzmayên serlêdana tundî ya bi zimanê dayîkê ya jinên Kurd ên li Stenbolê dijîn.

Agahiya pêdiviya me çima bi xebateke wisa hebû hat dayîn. Bi vê xebata me û di derbarê xebatên têkildar de agahÎ hatine bidestxistin. Di encama hevdîtinên me ya bi jinan a li qadan ragihandinên zehmetiyên di mijara xwe gihandina mekanîzmayan de ku rû bi rû mane hat kirin û me fikren xwe ya ji holê rakirina tundiya li hemberî jinê û tekoşîna newekheviya zayendiya civakî ya ku bûye sedema cûdaxwaziyê ya berpirsiyariyên rêveberiyên heremî dê çibin û çima pêdivî divê bi polîtîkayên baş kirine hebe ragihand.

### Me Çi Pirsî:

- Navenda Şêwirgeha ya Jinan a di bin banê şaredariya we de çend heb in?
- Xizmeta bi zimanê dayîkê li Navenda Şêwirgeha ya Jinan heye?
- Ji bilî cihê navendê, malê we yên gel ên taxan ku jin xwe bi rehetî bigihînine hene?
- Ji bo pêşî lê girtina jiyînên binpêkirina mafên jinên bi nasnameya nîjadên cuda yên ku tûşî tundiyê hatine hûn çi dikin?
- Piştgiriya wergêrvan tê pêkanîn?
- Xizmeta pir zimaniyê Li ber çavgirtina hemû nasnameyên nîjadî yên ku li herêmê dijîn tê pêkanîn?
- Xizmeta pir zimanî di metaryalên çap kirî û dÎjîtal de tê dayîn?

# Ziyareta Navenda Şêwirgeha ya Jinan a Şaredariya Avcilarê

Hat ragihandin ku di encamama pirsîna pirsan de ya di hevdîtinên bi Navenda Şêwirgeha ya Jinan a Şaredariya Avcilarê ji ber ku xebatkarê bi kurdî dizane hebûye di dema serlêdanan de hatine veguheztin û bi vî awayî gelek serlêdan çêbûne heta dawîkirina pêvajoyê jî bi jinan re di nav têkiliyê de bûne. Li gel vî piştgiriya wergêrvan nîn bûyê, da zanîn ku divê ji bo pêkanîna viya bi rêveberiyên heremî re xebatên diha bi kêr bên kirin. Bi taybetî serlêdanên bi Kurdî ji taxên Tahtakale û Yeşîlkentê hatine kirinê, hat ragihandin ku li gel vî li ser esasên pir zimanî ya di materyalên çap kirî û broşuran de; bi  Kurdî, Tirkî û Erebî hatine çapkirin.

Hebûna Du navendên jiyîna civakî ya jînan a ku girêdayî navenda şêwirgeha ya bi Navenda Şewirgeha ya Jinan ve ye li vê navenda şêwirgehê nêzikî hazerî ya bi jinan re hevdîtinên pêş ku hatine girtin, hat ragihandin ku ji xencî xizmetên pêşkêş kirina şêwirmendiyê ya ji bo jinan; bi tevahî çalekî û kargehên perwerdehî û geştiyariyê ya temasî 3500 jinan ku hatiye kirin de ku li van navenda şêwirgeha ya jinan 7 xebatkar dixebitin û bi domdarî li navendeke jiyîna civakî ya li taxan jî derûnnasek heye.

# Ziyareta Navenda Şêwirgeha ya jinan a Şaredariya Beşîktaşê

Hat ragihandi ku di hevdîtinên me ya bi Navenda Şêwirgeha ya Jinan a şaredariya Beşîktaşê re li navendê tenê serlêdanên tundiyê na li gel vê ku navendeka wan a bi rêvebirina xebatên bi hêzkirinê ya du pêlikî jî ku heye; li gel vê bi taybetî bi keyayên taxan re jî xebat hatine meşandin. Da zanîn ku ji avakirina wê vir ve 370 serlêdanên jinên ku tundiyê dîtine hatiye kirin û veguhestinên wan ên pêwistî hatine kirinê. Bi veguheztinê jin, zêdetir xwe gihandine Navenda Şêwirgeha ya Jinan; da zanîn ku ji ber populasyona navçeyê serlêdanên Kurdî qet nehatine kirin, lê dema ku bi Kurdî serlêdan bên kirinê tên veguhestin. Tenê piştgiriyê kanîna ya bi Tirkî û Îngîlîzî dikarin bidin.

Da zanîn ku di metaryalên pênasekirinê de ya pir zimaniyê nehatiye pêkanîn tenê metaryalên bi Tirkî hatine çapkirin.

Em di bîra li gor standardên navneteweyî û netewî ya tekoşîna li hember tundiya ya berpirsiyariya girîng ku dikeve ser milê şaredariyan li gel zêdetir daxwaza hevdîtinê bên pêkanîn jî, tenê Şaredariya Beşîktaş û Şaredariya Avcilarê bi awayê erênî li me  zîvirîn.

Ev rewş ji me re dide nîşan ku hin şaredariyên li Stenbolê bi saziyên di qada tekoşîna tundiya li hemberî jinê dixebitin de di xebatên çarçoveya di rêvebirina bi hev re  de tu gumanên wan nîn bûye.

Ji 39 navçeyên Stenbolê hevdîtinên tenê bi 2 şaredariyan ve çawa ku tekoşîna bi tundiya li hemberî jinê aksiyonê nade nîşan jî di hevdîtinên jinên ku li taxan hatiye pêkanîn ve; kêmaniya xwe zêdetir bigihînin şaredariyan a di mijara bi rêvebirina pêşî lê girtina tundiyê ya ku divê xebatên xwe berfirehtir bikin dide nîşandin.

# 3. ENCAM

Ev xebat bi armanca piştgiriya rapor kirina jinên Kurd ên xwe di gihandina mekanîzmayên tekoşîna tundiya bi zimanê dayîkê ku girêdayê şaredariyên li Stenbolê dijîn bên şopandin, dîtbar kirina zehmetiyên ku rû bi rû mane û xwe gihandina mekanîzmayên tekoşîna ya bi zimanê dayîkê hatiye amadekirin.

Li gel armanca pirsgirêkên di pêvajoya serlêdanê de ya astengiyên li pêşiya  xwe di gihandina mekanîzmayên tekoşîna tundiya bi zimanê dayîkê ya jinên Kurd ên tûşî tundiya mane hatiye lêkolînkirin.

Û xebata tespît kirina ji mafên xwe ya heyî ya zagonî ya jinên Kurd di çi astê de haydar in hatiye kirin.

Li gel raçevkirin û daneyên ku hatine bi dest xistin a di encama xebata şopandinê de ,dîtbar kirina zehmetiyên xwe di gihandina mekanîzmayên tekoşîna bi tundiya bi zimanê dayîkê ku jiyiyane, haydar kirina pêkanîna awayên pênasekirina tundiyê ya jinên Kurd, dîtbar kirina tekoşîn û serpêhatiyên jinên ku tûşî tundiyê mane û bi piştgiriya pêkanîna wekheviya zayendî ya civakî ya Tirkiyeyê ku alîgirê ya pêk anîna karîgerk a hemû xalên peymanên navneteweyî ya di mekanîzmayên tekoşîna tundiya li hemberî jinê hatine armanckirin

 Ji bo rakirina ji navê ya binpêkirnên mafî yên ji vî alîyî ve û kirina tevkarîyê li sererastkirin û sepandina bandorbar a sazûmanên armanc pê mafên mirovan in, kêmasî hatine selimandin û li wê gorê geşe bi pêşnîyazên cur bi cur hatiye dayîn.

Wek Komeleya Dema Jinê; serlêdanên ku li Navenda Şêwirgeha me ya Jinan hatine kirin, daneyên tundiya li hemberî jina ku em dişopînin de xalên girîng ên xwe di çarçoveya xebata ya bi rêvebirina ya bi destxistina vedîtinên a di encama hevdîtinên ku bi jinan re hatiye pêkanîn xwe dane der ev in;

- Hat raçevkirin ku kuştinên jinan bi vekişîna destnîşana ji Peymana Stenbolê zêdetir bûne.Li gor daneyên Platforma Rawestîna Kuştinên Jinan  ji dîroka 1ê Tîrmeha ya 2021î vir ve  737 jin hatine kuştin û bi awayek gumanî 557 jin jî mirî hatine dîtin.

- Zehmetiyên xwe di gihandina mekanîzmayên tekoşîna tundiyê ya jinên ku li Tirkiyeyê dijîn Bi vekişîna ji Peymanê zêdetir bûye, tune bûna mekanîzmayên piştgiriya bi zimanê dayîkê bi taybetî ji derketina ji cihê qada tundiyê ya  ji bo jinên Kurd  bûye asteng

- Ne serweriya zagonî ya peywirdarên ku li saziya berpirs in û esas negirtina xebata mafparêziyê bûye sedema bê baweriya jinan a ji mekanîzmayên piştgiriyê

- Li gel hemû van tiştan bi awayek ne tevlî kirina jiyana aborî ya wekhev  û newekheviya di qada îstîhdamê de *(bi cih ne kirina kar)* bûye sedema xizaniya kûr û xebata ne bi ewle ya jinan

Di hevdîtinên bi pêk anîna jinên Kurd ên ku me xistiye navenda çarçoveya vê xebata xwe de raçeviyên  jînên Kurd ên ku girêdayî van şeradariyan e yê me bi dest xistine, daye nîşan ku xwe di gihandina mekanîzmayên pêşî lê girtina tundiyê de bi gelek zehmetiyan re rû bi rû mane. Ev zehmetiyan mirov dikare wiha bide rêzkirin;

- Sûd negirtina ji mafên xizmeta bi zimanê dayîkê û pişt guh kirina resen a xwecihî ya Jinên Kurd ên li taxê xizan ên li Stenbolê dijîn.

- Rû bi rû mayîna normên qalibên çandî û xwe di gihandina mekanîzmayên pêşî lê girtina tundî ya bi zimanê dayîkê ya astengiya ziman.

- Di serlêdana ji bo tekoşîna tundiyê ya saziyê de ji bo ku bi Kurdî axiviye yan jî xwestiye ku bi Kurdî biaxive tûşî bûyîna  cûdaxwaziyê hatin.

- Negihandina  pêşkêş kirina  xizmetên pir zimanî  ya jinên herêmê.

- Ne pêkanîna şertên îstîhdamê ya wekhev ,ne afirandina derfetên aboriyî, nevekirina rêyên tevlîbûna karîger ên tevlî bûna jiyana civakî ya jinên Kurd ên Ji ber koça neçariyê  ku koçî taxên xizan /feqîr ên li Stenbolê hatine hiştin

- Xwe ne gihandina  ya jinên ku li taxên xizan de dijîn a xebatên parastin/pêşî lê girtin a mekanîzmayên tekoşîna bi tundiyê re û hay jê ne bûyîna jinan a ji van mekanîzmayan.

- Çêbûyîna pirsgirêka ji xwe nebawer a di jinan de ya Ji ber newekheviya zayendî ya civakî  ku bûye sedema cûdaxwaziyê,ne pênasekirina tûndî ya ku jin tûşî bûyê û hêza di xwe nedÎtina ya tekoşîna bi tundiyê re.

- Piriniya jinan ji ber ku ji aliyên kesên nêzî xwe ve tûşî tundiyê dibin, ev rewşa han tekoşîna bi tundiyê re ya jinan zehmettir dike.

*10 -  https://gazeteoksijen.com/turkiye/istanbul-sozlesmesinden-cekildikten-sonra-737-kadin-olduruldu-196049*

- Di dema  xwe îfade kirinê de xwe ne rehet hîs kirin jinan  a Ji ber nexebitandina  mekanîzmayên piştgiriya bi Kurdî,ev rewş  dibe sedema ne baweriya bi saziyên fermî  ve,

- Jin ji  ber jiyîna xizaniya ku her diçe kûrtir dibe pirsgirêkên çûn hatin û xwe negihandina gelek xizmetên din.

Xaleke  girîng a raporê ku divê bê diyarkirin agahiyên li gel vedîtinin bin xêzkirî de. jin di derbarê mafên xwe ya ji bo agahiyên zêdetir bi dest bixin  têkoşiyane.

Di hevdîtinê ku bi jinan re hatiye kirin anîn ziman ku piraniya wan gava herî girîng a ji derketina tundiyê ya bi pênasekirina tundiyê û nasîna mafên xwe ye, lê belê pê ve kirin ku  di demên ku tûşi tundiyê mane de asta wan a zanînê û hay ji xwebûnê tune bûye.

Rêzkirina daneyên girîng ên raporê de derketiye rastê; ji ber nexebitandina mekanîzmayên çalak û polîtîkayên ber alî ya ji holê rakirina cûdaxwaziyê ya ji ber newekheviya zayendî ya civakî û tekoşîna tundiya li hemberî jinê li gor standartên navneteweyî û netewî ya ku dewlet berpirsiyar e, bawer ne kirina ji mekanîzmayên piştgirî û tekoşîna bi tundiyê ya jinên ku li Stenbolê dijîn, tune bûna xwe gihandina mekanîzmayên piştgiriyê ya bi xizmeta zimanê dayîkê û zêdehiya xizaniya jinan

Zehtiya li hemberî jinê ya li Tirkiyeyê ya rast li hemû Cihanê em dibînin ku bi polîtîkayên devjêberdana ya bi pratîkên ji taqet xistinê ya bi gotinên zayendî yan jî  êrîşên li hember destkeftiyan ku zêde bûne û ji alîkî ve tekoşîna jinan a sînor nenas di xebatên mafên mirovan de zêde bûye.

Bi şanaziyeke mezin tînin ziman û girîngiyê didin; derbaskirina tixûb ,esas girtina pêştevanî,bi pratîka tekoşîna wekhev a bê pêşdarazî û meşîna li gel hev a bi hev re ku çi qas bi nirx û girîng e ye.

Rêxistinên jinan, femînîst, rêxistinên civakî yên sivîl, odeyên pîşesaziyan, baro, sendîka û hemû saziyên bi rêvebirana ya mafparêziyê, xebatên takekes ku hev û din dibînin, piştgirî dayîn, di pêkanîna bi bingehek a bi şirîkatî qasî serê derziyê be jî pêşî li mafên xesp kirî û yên binpêkirina mafan bigirin, dê bibe honandina bi hêz a mezinkirina tora tekoşînê.

Girîng e ku derfetên pêk anîna bi cih kirina kar a jinan, divêtiya polîtîkayên tekoşîna tundiya ya li hemberî jinê û divê bûna hebûnên mekanîzmayên parastin/pêşî lê girtin a çalak girîngiyê dide hebûn û tune bûna tekoşînê ya di avakirina jiyaneke bê tundî û wekhev a jinan.

Wek Komelya Dema Jinê berpirsiyariya xwe ya  derxistina holê ya tûş mayîna zehmetiyên ji ber dezavantajiya dubare û cûdaxwaziya hevbir a jinên Kurd ên ku li Stenbolê dijîn ev xebat hat amadekirin.

Hemû çalekiyên di derheqê ya mafên mirovan a ji bo jinan ku heya niha me bi rêvebiriye û bûye perçeyek jê ya ku di encama xebata şopandina ya ku halî hazir bi rêve dibin a bi amadekirina vê rapora xwe me cardin bi hev re dît ku;  wek jinan divê em dev jê bi rêvebirina xebata mafparêzî û ji nîşandina  dîtina yekane ya hev û din in  bernedin.

# 4. PÊŞNİYAZ

- Bi pêk anîna armanca ya ji holê rakirina cûdaxwaziya ya ji ber newekheviya zayendiya civakî û parastina mafên mirovan a jinan di serî de CEDAW û Tirkiye ya ku alîgirê belgeyên navneteweyî ye divê xebitandina mekanîzmayan bên bingeh girtin û bi piştevaniya li gel vê polîtîkayên wekheviyê bên afirandin

- Li gor Zagona Şaredariya ‘’Şaredariya bajarê mezin û şaredariyên ku serjimariya wan di ser 100.000 î ye neçar in  mêvanxaneyan a ji bo jin û zarokan vebikin. Şaredariyên din jî li gor rewşa aborî û  bi nirxandinên xizmetê yê pêş ew jî dikarin ji bo jin û zarokan mêvanxaneyan vekin. Li gel xala bingehîn a zagonî mêvanxane li bajarên ku  xwediyê şert û mercên guncav in jî bên vekirin. û li vê derê xwebûyînên  jinan bên çavdêrîkirin.

- Hejmara zêdekirina navendên şêwirgeha ya jinan a dibin banê şaredariyan de pişrgiriya hiqûqî û derûniya civakî li van dera bên dayîn

- Komîteya CEDAW’ê li gel Biryara Pêşniyaza Giştî ya bi hejmara 35an a fikraya **‘’e’’** ya di xala 40. de ji bo pêk anîna xwe gihandina bi awayê çalak a xizmetên berfireh a mexdûrên tundiyê ya jinan a şaredariyan. Bi hevkarî û tevlîbûneke tam a bi rêxistinên civakî yên sivîl a jinan re bê tesîskirin û avakirina mekanîzmayên serlêdanê ya pir sektorî ***(bîrgehî)*** û pêkanîna çalak kirina vanan.

- Bi hejmara zagona ya 6284an a pêk anîna çalak a ji aliyê hemû saziyên berpirs  bi girtina hezrên pêşî lê girtinê ku berpirsiyar in divê kesa ku tûşî tundiya maye di vê mijarê de bê agahdarkirin,

- Komîteya CEDAW’ê ya Biryara Pêşniya Giştî ya bi hejmara 35an a xwe dispêre  xala 43’yan ji bo jinên tûşî cûdaxwaziya hevbirî/pir alî, bi gihandina rêyên qenalên cûrbicûr ên medyayê û bi diyaloqê nav civakî ya maxdûrên tundiyê ya xwe dispêre zayendiya civakî ya li hemberî jinê /heyîna ji bo mayîna tûşiya tundiyê, têkildarên tazmînatê jî di nav de divê agahiyên xwe gihandina têkildar a çavkaniyên civakî û zagonî bên pêkanîn

- Jinên ku li stargeha dimînin, piştî veqetîna ji stargehan jî ji bo wan peydakirina xwe gihandina çavkaniyên aboriyê ya debar kirina jiyanê bê pêk anîn.

- Peydakirina xwe gihandina bi zimanê dayîkê ya hemû xizmetên ku di bin banê şaredariyê de tê kirin.

- Li ber çav girtina reseniyên hemû gelên ku li herêmê dijîn, bi xebitandina mekanîzmayên sûd jê girtina mafên bi xizmeta zimanê dayîkê ku bikaribe bi awayeke herî baş xwe bide îfadekirin, ji bo xebitandina van mekanîzmayan kesê/a ku serlêdana tundiyê digire divê serwextê zagona be û peydakirina fêmkirina zimanê ku jin pê diaxivin bê pêk anîn, heke neyê pêkanîn divê teqez piştgiriya wergêr bê pêşkêşkirin,

- xwe gihandina berfireh a bêyî cûdaxwaziya çînî bê kirin; zayendî,ber pê bûna cinsî, nîjad, ziman. nasnameya zayendî, ol *(dîn)*, rewşa zewacê rewşa tenduristiyê, berastengî divê xizmetên hemû mekanîzmayan a ji bo serlêdana tekoşîna bi tundiyê re hebe.

- Bi taybetî jinên Kurd ên ku neçarî koç kirina taxên xizan ên li Stenbolê hatine kirin ji bo bikaribin xwe bigihînin naverokên agahdar kirina bi Kurdî divê li taxan civînê agahdar kirina bi Kurdî ya li ser tekoşîna bi tundiyê re bên lidarxistin, berbelav kirina metaryalên dijîtal û çapkirî

- Bi tevlîbûna jinan û rêxistinên civakî yên sivîl bi şaredariyan re planên stratejîk û planên çalekiya ya wekheviya herêmê bên pêkanîn.

- Pêk anîna butçeya bi hestiyarî ya wekheviya zayendiya civakî ya bi armanca ji holê rakirina tûşî hiştina binpêkirinên mafên a jin û LGBTÎ yan wekî ya mafê xebatê, mafê çûn û hatinê ya şaredariyan.

- Şaredarî ji bo jinan bajara ewletir bikin, kuçe û taxên tarî bên ronîkirin.

- Şaredarî ji bo jin û zarokan çalekiyên hunerî ya bê pere an jî vekirina navendên çalekî û hunerî ya bi pêk anîna ya bi  pereyek hindik.

- Ji holê rakirina pirsgirêka tûşî mayîna ji ber awayên jiyîna çanda xwe û bi zimanê xwe ya di serlêdanên mekanîzmayên saziyên fermî ya jinan.Ji bo ji holê rakirina pirsgirêka tûşî mayîna nêzikatiyên cûdaxwazî ya kesên berpirs perwerdeya bi hestiyariya çandî bê dayîn. Di vê mijarê de bi saziyên çandî yên li Stenbolê hevkarî bê kirin

- Ji bo peyda kirina wekheviya zayenadî ya civakî li taxên ku Kurd nufusa wan zêde ye divê kargehên agahdar kirina bi Kurdî bên lidarxistin. Bi zimanê dayîkê ya di mijarên tekoşîna bi tundî û xwe gihandina mekanîzmayên tekoşîna bi tundiyê re bên agahdarkirin.

- Bi pêş xistina polîtîkayên li ser zêde kirina qadên ku jin xwe lê ewle hîs bikin û pêk anîna xebitandina mekanîzmayên tekoşîna bi tundiyê ya bê pêşdaraz a fêmdar û gihandina bi hêsan.

- Berbelav kirina bi awayê xwe gihandina hemû jinên li herêmê dijîn bi rêgezên xebata pir zimanî ya şaredariyan; xizmetên bi pir zimanî divê bigihên jinên ku li herêmê dijîn li derveyî cihên navendî ya xebatên dîtbariyê tim û tim bên pêkanîn.

- Hêzên zabita ***(bazbend)*** yên li mekanîzmayên tundiya li hemberî jinê dixebitin, hemû lijneyên di bin banê Wezareta Xizmetên Civakî ya Malbatê, pêwendarên dadgehî, Dadgehên Malbatê û xebatkarên alîkar a buroya edlî, xebatkarên tenduristiyê, li ber çav girtina berjewendiyên bilind a zarok û jinên ku tûşî tundiyê mane, peydakirina pêk anîna veguheziyê ya şêwirmendî ya di çarçoveya rêgezên pîşeyî ya sazumankirina netewî.

- Divê şaredarî bi komeleyên jinan û STK'yên din a di vê qadê de dixebin re hevkariyê bike û xebatan bi hev re bidin meşandin.

- Di yekem serlêdana saziyan de Agahdar kirina kesan a li ser zagonê, pêk anîna piştgirî dayîna vîzyona sûper a ji bo kesên pispor ên ku li vê qadê dixebitin

- Bi awayek karîger a berpirsiyariyên di Deklarasyona Pekînê û Platforma Çalak a ku Tirkiye bê dudilî qebûl kiriye de cih digire divê pêk bîne û di mijara wekheviya zayendî ya civakî divê bingehek guncan bê peydakirin.

Kadın Zamanı Derneği
*Komeleya Dema Jinan*
*Women's Time Association*

KADIN ZAMANI DERNEĞİ

**KADIN ZAMANI DERNEĞİ**
Şehit Muhtar Mahallesi Bekar Sokak No:7
Daire:5 Beyoğlu İstanbul

**info@kadinzamani.org**